

# Mewlûd


Melayê Bateyî



# Mewlûd

## Melayê Bateyî





Di sed sala 15'an de yek ji hozanên Kurdê namîdar Mele Ehmedê Batê ye. Batê ji gundê Batê ye. Gundê Batê bi Hekarî ve girêdayî ye. Rehma Xwedê lêbe Batê niha li gundê Batê di wargeha xwe ya ebedî de raketiye. Di derbarê mêjûya ji dayîkbûyîn û mirina wî de ramanên cuda, lê pir ji hev ne dûr hene. Ji van cihêwaziyan dîtina Celadet Bedirxan ev e: (1417-1491)
Di dîroka wêjeya Kurdî de piştî Elî Herîrî, Melayê Cizîrê û Feqiyê Teyran, weke hozanê çaran tê pejirandin. Ji berhemên Batê yên giranbiha yek jî Zembîlfiroş e. Li gor lêkolînvan û pîsporên wêjeyê Batê dîwanek jî li pê xwe hiştiye lê mixabin ew dîwan di dest de be jî heta îro derneketiye holê. Bê guman ev afirandina Melayê Batê di nava qilasîkên Kurdî de cihekî bi rûmet û qedirbilind digire. Mewlûda Batê di çarçova ziman û wêjeyê de jî xwediyê qonaxeke bilind e.

# PÊŞGOTIN

***Xwendevan'ên hêja û qedirbilind.***

Mewluda Kurmancî ya herî kevn hatiye nivîsandin, Mewluda kû mela Ehmedê Batê nivîsandiye. Ev mewlud wek çandekî Kurdan li hemu deverên Kurdîstanê hatiye xwendin û tê xwendin.
Di xwendina Mewludan de xwarin û vexwarin tê parve kirin, civak dicive serhev, dilxweşî û şahî çêdibin.
Her çiqas pesnê Pêxemberê me hz Muhemmed sxl werin gotin jî, Divê Mewlud wek Qur'an a pîroz û çavkanîyên Olî neyê nirxandin!
Mewlud kultur û çandekîye, rengê wî Ol tête hebe jî, pesnê Pêxember têde hebin jî, nabe Misilman Mewludê weke çavkaniya Ola Îslamê binirxînin.
Mewlud wek Wêjeya zimanê Kurdî, helbestên kû jibo Pêxemberê me ji hêla Mele Ehmedê Batê ve hatine Nivîsandin ewe. Mewlud weke çandekî Milletê me dinav gelê mede bicîh buye û buye çandekî Civakî.
Ola Îslamê çavkaniya wî Qur'an a pîroze û dê her Qur'an a pîroz bimîne.
Divê çavkaniyên dîtir wek Ol neyin bidestgirtin. Ger em çavkaniyên dîtir wek Ol bigrin dest emekler Ol xira bikin.
Ev çanda Mewludxwendinê divê weke çandekî  were dîtin û bivê rengê jî were parastin.
Xwendevanên Hêja: çanda gelan jiyana gelane, jiber ku dewletên dagirkerên Kurdîstanê ziman û çanda Kurdan qedexe kirine, diva Kurd jî ziman û çanda xwe bi çar destan bigrin û biparêzin.
Mewluda Kurdî bi Tîpên Erebî hatiye nivîsandin, gelê me zêdetirê wî nikare bi Herfên Erebî bixwîne. Jiber vê pêdivîyê me bi Tîpên Latînî ligor eslê Erebî Nivîsand. Xizmet jime, xwendin jiwe.

Hafiz Ahmet Turhalli

# Mewlûd

## Melayê Bateyî

*Bîsmîllahîrrahmanîrrahîm*

## BEŞ-I

Hemdê bê hed bo Xwedayê alemîn
Ew Xwedayê da ye me dînê mubîn

Em kirine ummeta xeyr-ul beşer
Tabi'ê wî muqtedayê namûwer

Ew Xwedayê malikê mulkê ezîm
Daye me mîrasa Qurana kerîm

Dînê me kir kamîl û nî'met temam
Ye'nî dame Ehmed û darûsselam

Ew Xwedayê bê nezîr û zulcelal
Bê mîsal û bê heval û bê zewal

Raziqê bê dest û pa û mar û mûr
Alimê sirra negotî der sudûr

Karîsazê bende û sultanîcan
Rahîm û Rehman letîf û mihrîban

Asîmanê bê sutûn wî kir bedîd
Sûretê ba xal û xet wî aferîd

Hêvîdarin em ji te şahê kerîm
Ihdîna ya Reb sîratel musteqîm

Nê ji me sûc û xeta tên û sîtem
Lê ji te îhsan û xufran û kerem

Ya Reb îmanê dixwazin em mudam
Jêrê alaya Muhemmed wesselam

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat

## BEŞ - II

Ber tu ba da her zeman û an û hîn
Ey Muhemmed sed hezaran aferîn

Ey şefî’ê darûyê her illetê
Dîde û binahiya vê ummetê

Destegîr û mustexasê her du kewn
Bo gunehkaran penah û pişt û ‘ewn

Sellî ya Rebbî ‘ela xeyr-îl beşer
Ta hebin teyr û bixwînin ber şecer

Ew hebîbê rohniya heft asîman
Her du alem qalib ew ruh û rewan

Xakîpayê Ehmed ew Beyt-ul Heram
Lew şerîf in Zemzem û Rukn û Meqam

Sellî ya Rebbî ‘ela xeyr-îl wera
Ma tesîrûş-şemsû fîs-seb-’îl-‘ula

Fexrê Îbrahîm û İsmaîl û Nûh
Mustafayê ba wefayê ba fitûh

“Ma remeyte îz remeyte” goşîdar
Destê wî destê Xweda der kar û bar

Sellî ya rebbî ‘ela xetmîr-rusûl
Ma yemûc-ul aşîqûne fîs-subûl

Ew kelîmê xweş newayê çerxê Tûr
Daxîdar im bo wî sîmayê bi nûr

Ey şefî’ê sahibê alayê hemd
Min hene bê hed guneh, nisyan û ‘emd

Lê me hêvî wasîq e dê ez feqîr
Jêrê alaya te bim roja ‘esîr

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat

## BEŞ - III

Her kesê guhdarê mewlûda nebî
Dergehê mizgîniyan dê lê vebî

Gotî wî pêxemberê ‘alî-sîfet:
- Mewlûda min her kesê mazin biket,

- Ez şefî’ê wî me roja mehşerê
Dê vexut ew tasek ava kewserê

- Serfê Mewlûda me yek dirhem fer e
Hemberê yek Kohê zêrê ehmer e.

“Fî sebîlîllah” bi bexşî ber feqîr
Qedrê Mewlûdê bizanin hûn keb

Hem ji bo Bekr û ‘Umer hat ev xeber
Hem ji ‘Usman û ‘Elî çêbû eser

- Dirhemek bit serfê Mewlûda Nebî
Xêrekî mazin ji bo hasil dibî

Hem ji Şeyxan bû rîwayet ev xeber
Şêxê Kerxê, Fexrê Razî ba dîger:

- Her kesê hazir biket ew yek te’am
Ba bixûr û şerbet û qedrek temam

- Gazîket îxwan û hilbîtin çira
Bê te xwendin Mewlûda xeyr-ul wera

- Tête heşrê ew dîgel xelqê berî
Ye’nî ba pêxemberanî enwerî

- Herçî bînit hindî tiştê xwarinê
Dê mubarek bit li ber vê xwendinê

- Bê te xwendin ger li yek sikke-dirav
Dê mubarek bin derahin bêne nav

- Bê te xwendin ger li avê, ê vexwut
Rehmê nazil cumle ê ‘illet dibit

- Her cihê lê bê te xwendin rehme lê
Dê melek bibin tijî wê menzelê

- Xaniyê lê bê te xwendin ev sela
Dê bibîte ba’isê def’a bela

- Bo xudanê zadiyû bo hemnişîn
Her selatan dê bidin kerrubiyîn

- Dafi’ê cumle hesûdê çavxirab
Der mezarê sehl e lê, redda cewab

- Pur kesan dîtin keramet û eser
J’xwendina mewlûda sultanê beşer

Her wekî hatiye gotin bê hîsab
Lê neşim bêjim ji tetwîla kîtab

Qedrê mewlûdê nizanim bêjim ez
Lêk huşyarbin da nebîte cergebez

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat

## BEŞ - IV

Girtî yek qebde ji nûra xwe Xweda,
Gote wê: “Kûnî hebîbî Ehmeda”

Hêj ne erş û ferş û kursî û qelem
Hêj ne lewh û enbiyayê muhteşem

Saliha tesbîhê kir nûra şîkerf
Şeş mîet elf û çîhar û bîst û elf

Paşî bo wê çêkirî duwazdeh hîcab
Her yekê xweştir ji ya dî bê hîsab

Qudret û Te'zîm û Mînnet, Merhemet
Hem seadet, hem keramet, Menzîlet

Hem hîdayet, hem nubûwet, rif-'et e,
Ta'et e yazdeh, şefa'et temmet e.

Her yekê westa bû tê da çendî sal
Lê eded me-spare 'ilmê "Layezal"

Her yekê tesbîhekî xas û cuda
Daîma tesbîhê xwendin bo Xweda

Paşi avête çihar behrê mezin
Wî Xwedayê "Layezal" û ins û cin

Behrê nusret, sanî behrê merhemet
Behrê qudret, behrê îrfan în hemeh

Çûn ji behra me’rîfet ew hate der
Qetre jî weryan bi îlham ev qeder

Sedhezar û hem çihar û bîst-i elf
Her yekî bû yek nebiyê dil şikerf

Paşî wê çêkir ji nûra namiwer
Cewherek lê kir nezer, ew bû du ker

Nisfê ewwel da yê çavê heybetê,
Nisfê sanî da yê çavê şefqetê.

Nisfê ewwel bûye behr û her livî
Nê ji tirs û heybetê qet nanivî

Hem kelî ew behr û kef da û dûxan,
Kef bûye erd û dûxan bû asîman.

Nîveka dî çêkirin jê çarî çîz
Erş û kursî û qelem, lewhê temîz

Hate emrê padîşahê “layezal”
Malîk-ul mulkê celîlê zul-celal

- Ya qelem binvîse bi emrê padîşah!
- Ez çi binvîsim bi ferman, ya îlah?

Qale: “Uktub la îlah îlla ene”
Hem Muhammed qasidê emrê min e.

Sacid û bê hiş gerî sedsalê dî.
Ser hilîna got: - İlahî, seyîdî,

- Ez dizanim la îlah îlla tu yî
Ew Muhammed hemberê îsmek bûyî

- Kîjke ya sultanê ba cûd û kerem?
Padîşahê sermedî got: - Ya qelem,

- Ger ne bûya ew Muhammed, lewh û erş
Min netînane wucûdê ta be ferş,

- Ney tu û ney cennet û narê mezin,
Cumle eşya min ji bo wî çêkirin.

Muhbetê hingavt û şeq bû ew qelem
Ma li ser lewhê, nivîsî dem bi dem.

Serxweş û sekranî wî navê şîrîn
Paşî, ba îlhama Rebb-il ‘alemîn,

Goti ewwel: - Ya Muhammed esselam
Hem eleyke gote Rebbê “layenam”

Da cewaben ‘en hebîb-îl izzetê:
- We ‘eleyke esselam û rehmetê.

Bûye sunnet lew selam û redd e ferd
Cumle ehwal paşî hingê kirne erd.

Wê nivîsî pêkve ummet, qencîkar
Cennetîyû asiyan dê biçne nar.

Ummeta Ehmed nivîsî ehlê nûr
Ummetun muznîbetun Rebbun xefûr.

Cumle ê ehwalê ‘alem bîş û kem
Wê nivîsî borî û hişk bû qelem.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ - V

Çûn îradet hate sultanê refî’
Çêkirî Adem bi vî şeklê bedî’

Emri hate goşê Cibrîlê emîn:
- Qebde ê bîne ji beyda ê zemîn

- Ew dilê erdê û hem husn û biha
Zîneta meknûn û durra bê biha

Hate Cebraîl û ba emrê letîf
Çengekî axê ji wê qebrê şerîf

Girt û ba tesnîmê safî kir hevîr
Têkveda, hetta ku ew qenc bû xemîr

Bû wekî durra sipî wê saetê
Xewte da der co û barê cennetê

Emrê Cebraîlê kir paşê çunan:
- Wê bigîre der zemîn û asîman,

- Behr û berr û şerq û xerbê alemê
Hate gêran hêj ne behsa Ademê.

Nê hezaran sali çûne axirî
Ew nebî bû, Adem hêj av û herî.

Paşî hingê xaliqê her sûretê
Çêkirî Adem bi destê qudretê

Pufkirî rûha xwe ew bû nazenîn
Lew melek hatin ji bo wî sacidîn

Bû xezîne ew ji bo durra yetîm
Daniye pişta wî ew nûra ‘ezîm

Paşî bir avête baxê cennetê:
- Xeyrî darê, jê bixu her ni’metê!

Sef bi sef westan e pişta wî gelek
Nazirê nûra Muhammed ew melek

Goti Adem: - Ew melaîk bo çi, her
Wê li pişta min dikin daîm nezer?

Rebbê ‘alem gote Adem: - Ey mulî
Tu ji bo nûra Muhammed hamilî,

- Ew hebîbê min di pişta te zuhûr,
Lew melek têne temaşayê ji dûr.

Goti Adem: - Ey Xwedawendê felek,
Min divêtin bêne pêş min ew melek.

Hem bi fermana Xweda wê saetê
Nûr ji piştê hate nîva cephetê.

Hin dibêjin hate tilya şahidê
Lê heqîqet, her dizanîtin Xwedê.

Mislê rojê hatiye ewca felek
Hem teheyyur Adem û hindî melek.

Goti Adem: - Ya Rebb, ew nûra qebûl.
- Ma te tiştek? gotê: - Eshabê Resûl?

Goti Adem: - Ya îlahî qence bêt,
Bê te tilyan herçî maye, min divêt.

Nûra bû-Bekrû di wusta û ‘Umer
Dî Binser û ‘Usman di xunser, musteqer,

Hate îbhamê dibin nûra Elî.
Şu'le da tilyan û cennet muncelî.

Hati Hewwa û nezer da nûrî saf
Goti: - Ya Adem çi nûra pur şefaf?

Goti: - Nûra yek nebiyê mazin e
Seyîd û hem serwerê nesla min e.

Çunkî bê emrî ji Adem bû zîhar
Nûr, ji enyê hate piştê bû sitar

Nê, ji darê xwarin herdûkan şirîn
Hulle ê cennet ji bejnê da firîn

- "İhbîtû mînha cemî'en" hate 'emr
- Adema dî pêkve, lêkin bi sebir

Der "Serendîb" ê bi erdê ket girî
Çendî salan rohnikê wî bûn herî

Rohnikê wî şîn kirin dar û nebat
Çûn di erdê dau pa û mayi mat

Pir giriyû xweş girî bê hed gelek
Newheê “înna zelemna” çû felek

Rojeki ew der sucûdê bê mefer
Pir giriyû hem li ‘erşê kir nezer

Dît nivîsî “La îlahe îllellah,
Ba Muhammed ba resûlullahê şah”

Got: -Bi heqqê an Muhammed keyte neqş
Wî kirî ba îsmê xwe, ber saqi ‘erş,

- Tu bi xufranê minî bê çare, ah.
Hate Cebraîli ba emrê Îlah:

- Ser hilîne Adema, ‘efwa celîl
Bo te hat û rabe, ey ziba cemîl,

- Hurmeta navê Muhammed an resûl
Tewbeya te bû qebûl û her qebûl.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-VI

Çûn ji Adem nûra Ehmed bû cuda
Hate pişta Şîs û burhan-ul huda.

Hate eslabê butûnê tahîr e
Qet nebû yek jî xerab û facîr e

Fewqê Ednan ta ji Adem îxtîlaf
Tê heye, lew bê tifaq e ev mesaf

Jêrî Ednan ta bi Ebdullah guhest
Bîst û yek bab in, hemî rast û durist

Hin yekî Ednan û Me’d û hem Nezar
Mudr û Îlyas in, bizan ey goşîdar

Mudrîke, paşê Xuzeyme taze ‘eyş
Hem Kenan e, paşê Nedr e bû Qureyş

Malik û hem fehr û Xalib hem Luwey
Ke’b û Murre hem Kîlab û hem Qusey

Hem ji pişta wî Quseyyê pak û saf
Ew emanet hate nik Ebdulmenaf

Hem ji nik Ebdulmenaf ew muxtefî
Hate pişta Haşim ew nûra sefî

Hem ji Haşim bû emanet munqelib
Hate bû mêhvanê Ebdulmuttelib

Silsila wî ta bi Adem da û bab
Pêkve dê biçne behiştê bê hîsab

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-VII

Hem ji Ebdulmuttelib bû hamîle
Fatîme, hem muddeteş bû kamîle

Jê bû Ebdullah bi hukmê sabîqe
Nûra Ehmed der cebîneş barîqe

Mezherê nûra Muhammed hate ew
Pak û nûranî mûeyyed hate ew

Cubbeê Yehya di Şamê da numûn
Sûfeke spî bû hemî têkda bi xwûn

Girt û xwûnê Cubbeê Yehya çûnar
Wê demê bûye şehîdê pêşiwar

Hişki bû ew xwûn û borîn rozîgar
Ta wucûdê Ebdullahê namîdar

Taze bû ew xwûn û mercan bûne rêz
Rahiban got: - Ayi way, exbari nêz,

- Wext e rabit Ehmedê ‘alî-’elem
Nasixê Tewrat û Incîl û senem

- Hat xudanê seyf û Qurana mubîn
Xwûnê Yehya bo nîşan e, wê yeqîn.

Lêk vegeryan hem sûal û hem cewab
“Wayê-weyla” kefte nav ehlê kîtab

Wan yeqîn kir Ebdullah hate wucûd
Ba ‘edawet qesd kirin qetla wî zûd

Ehlê kîzb û ehlê zur û îftîra
Çendî caran hatine Umm-ul Qura

Ebdullah der hifzê sultanê wedûd
Nûra Ehmed dafi’ê şerrê Yehûd

Ebdullah mazin bû ba naz û delal
Canê Ebdulmuttelib ew mah û sal

Xweş divê babi ezîzê maderê
Rohniya malê û zîba esmerê

Şekl û sîma mislê bedra asuman
Nazik û re’na û nûra xanedan

Dilber û mehbûb û şêrîn û şeker
Her kesê ew dîtî dil lê bû du ger

Duhtê çakanê Qureyşî yû ‘Ereb
Muntezir bûn pêkve bo wî roz û şeb

Her yekê hêvî dikir ew bit qebûl
Ba yekê wî qet neda meyla wusûl

Bû di waza ew ji fikra în û an
Yumnê nûra Ehmedê bû pasîpan

Rojekê wî gote babê: - Ya Emîr
Saeta ez biçme Bethayê Beşîr,

- Min ji piştê tête der nûrek mezin
Radibîte ser serê min, ew ji min

- Ez dibînim munqesem bûye du ger
Yek di şerqê yek di xerbê çûye der

- Têne ve çeşpan û çapik bê dereng
Têne ser yek, mislê ‘ewrê tazereng

- Ez dibînim asuman bûye du şeq
Radibit ew nûra ta heftem tebeq

- Têneve fîlhalî zan alî meqam
Ez dibînim tête piştamin temam

- Sa’eta rûnim li ser mehda zemîn
Min ‘ecaib têne pîş im aferîn

- Hem ji erdê tête sem’im ev kelam:
Wê digel te nûra Ehmed, wes-selam.

- Her çi dara hişke ez biçme binî
Bû hêşîn û kesk, ji pelgan pir xenî

- Bû sih û seywan li ser min nagihan
Ez ku çûm, bû hişk û bê pelg û xusan

- Ew çi remz û hal e, babo bêje min?
Gotê babê: - Rohniya çavê di min

- Şa be, min mizgîn li te ey nazenîn
Wê ji te zahir bitin şahê emîn

- Hêviya min wasiq e dê rabitin
Ehmedê mursel ji te peyda bitin

- Eşrefê mexlûq û sultanê cîhan
Dê ji te peyda bitin bê şek bizan

- Min diye der xwab û mame muntezer
Ehmed ez puşta te ye, canê peder

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-VIII

Çunkî Ebdullahî rabû pakî zat
Nê li qetla wî cuhûdan kir xebat

Rahib û ehbar û hem ehlê kîtab
J'agirê kerbê hemî bûne kebab

Hatine heftê cuhûd ez mulkê Şam
Taze bey'et best û 'ehda natemam

Cengî û merdê dilawer şêregîr
Pêkve xwarin sond û bestin têr û şîr

- Ta ne ête kuştin ew zîba xiram
Yek ji me na ête ax û mulkê Şam

Rahê sehran girt ewan ê kîne doz
Mislê kundê her bi şeb çu, ne be roz

Zû gehîştin çûne dora Mekkehê
Ketne pûsan, mislê ava bin kehê

Ta bibînin kengê bîtin fursetê
Newbedar ketne kenarê hêşetê

Rojekê wan dî bi çolêda meşî
Talibê nêçîr û ahûyê xweşî

Wan ku dî rabû rê Ebdullah çû, an
Ba tenê tenha bi çolêda rewan

Firseta xwe dîn û rabûn şîr-hesûn
Çûn di peyda, mislê gurgê devbixwûn

Hem di wê rojê li seydê bu weheb
Ye'nî babê Amînê a'lî neseb

Çûn seda hat û Weheb lê kir nezer
Hate Ebdullahê qewmê xwûncîger

Refde gurgek hate berxê nûciwan
Lê belê hişyare lê zîba şivan

Nagehan vêkre Weheb dî j'asuman
Hate xwarê leşkerê rûhaniyan

Xeybiyanê keskepoşê gul-'îzar
Hatin, ew jêkrakirin jê, tar û mar

Terfet-ul 'eyni cuhûd berbad kirin
Wan ji iqlîmê cîhan winda kirin

Sa’eta sirra ji xeybê dî Weheb
Maye heyran û vemayi der ‘eceb

Çûn ji Ebdullahi dît ew sirr û hal
Xweş li lewhê dil nivîsî ev xeyal:

- Ger qebûl ket daye wî min Amîne.
Pak û me’sûm e, efîf e, mûqîn e.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-IX

Paşî wê sirra ezîmê nûrîtab
Nazilê qelbê Weheb bû îdtîrab

Çapik û çespan vegerya hate mal
Wî hîkayet kir ji bo mala xwe hal

Hin hîkayet kir ji bo zewcê Weheb
Hem keramet hem ji cenga bi-l’eceb

Gote zewcê: - Qence qasid bî ji min
Rabe biçne Xanedana der mezin

- Bêje Ebdulmutelib: - Min Amîne
Wê li nik zîba ‘efîf e mûqîn e,

- Ger ji Ebdullah bibîtin ew qebûl
Temşiyet dê bêt û çêbit ew wusûl,

- Nazik û sîma û xweşdîlber ew e,
Layiqa wî, babeta wî her ew e.

Hati Ebdulmuttelib kir ba xeber
Hem di Ebdullahi hubbê kir eser,

Goti: - Dayê rabe, ey zîbaxîsal
Zewceyê bo min bixwaze bes delal,

- Ba cemal û ba kemal û ba edeb
Xweş-eda, şêrîn-lîqa, ‘alî neseb.

Zû di rabû Fatîme dilşadîman
Nazirê ber sûretê gulçehrekan

Pir şepal û gul rûxanê taze ‘eyş
Sakînanê perde ê alîqureyş

- Dilnewaz û pêkvenaz û qendileb,
Kes nedî şêrîntir ez binta Weheb

- Amîne gul bû, di gulzarê cemal
Husnî bê hed, qed û qamet î’tîdal

- Dê çi bêjim ez cemal û me’rîfet
Walîda Ehmed bes e her ev sîfet.

Fatîme dît û vegerya, damîne
Gote Ebdullahi behsa Amîne:

- Mislê wê nabin şepal û nazenîn
Ne di dunya ne di fîrdewsa berîn.

Cari dî çû dît û ew nazik nîhal
Lê vexwarîn, babetin her du heval.

Hate Ebdulmutelib rakir ji mal
Çûn ji babê xwestin ew re'na delal

Weqiyek zîv û weqiyek hem zeheb,
Sed şutur, sed pez, ewî dane Weheb,

Sed beqer cumle cuwan û samîn e,
Bû hinarin, pêkve nextê Amîne.

Hate Ebdulmutelib wê saetê
Kir tedarik kar û barê dawetê

Çêkirin zad û te'amê bil-'eceb
Hem Qureyşî xwendin û hindî 'Ereb

Amîne xemlî ji rengê gulşenê
Zend û bazin reş têne j'rengê henê

Xweş newa û xweş eda hatin 'Ereb,
Cum'e bû ew şeb, nehê mahî Receb

Wê şevê anîn nîkah û 'eqd û best
Bûk û zava man û şerbet dane dest.

Der Mekkeê meşhûr bû ev gotine:
- Ebdullah zava ye, bûk e Amîne.

Hesret û kerbê hemî berbad kirin
Wê şevê sed jin temamî jê mirin!

Bûk û zava her du çûne xelwetê
Şahiyane kefte baxê cennetê.

Zû di Rîdwani vekir babê cinan
Daketin dergahê nîran nagehan

Hor û xilman û çem û teyr û nebat
Hatine hemd û senayê xweş luxat

Ez demê can bexşî Cibrîlê emîn
Mujde da ehlê semawat û zemîn

Cebraîl got: - Hate dewra Ehmedî
Hati şahê mislê wî çavan nedî:

- Rabe mizgînê bibe j'mexlûqê ra
J'asuman û erd û ta tehtessera.

Xulxule peyda bû der heft asuman
Sewtê tesbîhê melek çû "Lamekan"

Hate xwarê Cebraîl û mujde da
Keski alayek li banê Ke'be da

Mujde da mexlûqehayê behr û ber
Cumle heywanata zanî ew xeber

Xweş nîda hat ez yesar û meymen e:
- Nûra Ehmed hate çû nik Amîne

- Hati nûranî şefî-‘ul muznibîn
Hati xeyrunnasî xetm-ul murselîn.

Wê şevê hindî senem bûn sernigûn
Textê Iblîsê le’în bû wajigûn

Lew li ser sûret revî teşbîhê mar
Hate gohê Bûqubeys û kir hewar.

Zuryeta wî cumle hatin bê newa,
Ew çi hale bêje me? Wî gote wa:

- Lew li min çêbûye tirs û zelzele
Ba Muhammed Amîne bû hamîle,

- Hate dewra Ehmedê dewra me çû
Lat û Uzza dê biket bê ab û rû,

- Yek ji me êdî neşîtin bit ‘eyan
Wî, li me rê girt ji çûna asuman

- Hati xwûnrêz û cîhangîr û sefak
Em ji destê wî hemî dê bin helak.

Rohniya her du cîhan û milletan
Ummeta wî çêtirînê ummetan.

- Dê çi bit halê me û tedbîr û ray?
Ay û way ay û way ay û way !

Hem di subha wê şeva dewlet fuzûn
Textê şahanê cîhan bû sernigûn.

Bê tekellum ma devê hindî milûk
Şah eger, hakim eger, mîrê mulûk

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-X

Amînê got: - ta kî şeş meh çûne ser
Min ji hemla xwe nedî qet yek eser,

- Paşê şeş meh hate min awazi xeyb:
Min li te mizgîni ey pakîze ceyb

- Wê digel te xatemê peyxemberan
Nasixê herfa kîtab û defteran

- Lê di xewnê da me dîtin bê ebed
Enbiya û remz û nîşan û sened

- Ewwela, min dî ji min nûrek diçî
Qesrê Besra min ji ‘eksa wê didî

- Mahê ewwel hati Adem teyyîba
Kir selam û gote hemlê: - Merhaba.

- Mahê sanî hati Şîs ez meymene
Gote min: - Mizgîn li te ya Amîne.

- Mahê salis hati Idrîsê nebî
Kir selam û: - Mujde ber hemlê te bî.

- Mahê rabi’ Nûh û xamis Hûd û hem
Hatin û mizgînî da min pur kerem.

- Mahê sadis hati İbrahîm Xelîl
Da me mizgînî ji wê hemlê cemîl.

- Mahê sabî’ hati Îsmaîl zebîh
Mujde bexşî min ji wê hemlê melîh.

- Mahê samin hatî Mûsa ba wefa:
Ibşîrî ya Amîne bîl Mustefa.

- Mahê tasî’ hatî İsa j’asuman
Mujde da min: - Hatî sultanê cîhan.

Ew ku şeş meh çûn ji hemlê munqelib
Gote Ebdullahê Ebdulmuttelib:

- Ba tîcaret tu biçî ta semtê Şam,
Ez Medîne bar bikey temr û te'am,

- Wê dema dî Amîne godek bibî
Yek ziyafet lazime de'wet bibî.

Ebdullah an mahi rûyê gul'îzar
Der Medîne şerbeta mergê vexwar.

Umrê Ebdullahê bîst û pênc e sal
Borî yû wî kir ji dunya îrtîhal.

Zanî Ebdulmuttelib ew waqî'e
Her du çavê Amîne bûn damî'e:

Esmerê min ma ji xelkê Karîwan
Hatine peydane ew Ruhu Rewan

Kan hebîbê min, dilê min bû du nîm?
Ah û hesret godekê min ma yetîm

Dar û ber bû wê girîn wê saetê
Ab û rohnik nadinê qet muhletê

Hem melek rabûn we gotin: - Ya Kerîm
Nê hebîbê te Muhemmed ma yetîm

Malîk-ul mulkê mezin da ev cewab:
- Çêtirim bo wî ji xeyra da û bab,

- Ey xudawendanê eqlê musteqîm,
Kes nizanit qîmeta durra yetîm.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-XI

Ez Rebî'ul ewwela şev rewşen e
Heşt ê şev borîn li hemla Amîne

Ya nehê zail bû jê tirs û 'ena
Ya dehê bû mujde der Xîf û Mîna

Yazdehem bû xulxule awaz û hem
Zemzema tesbîhê der hindî Herem

Duwazdehem hilbû şemala dewletê
Amîne mabû tenê der xelwetê

Wê şevê der Ke'be Ebdulmuttelib
Ma bû, bo te'mîra erdê munqelib

Amînê got: - Mam tenê bê mêr û jin
Ez demek tirsam û lerzî hate min,

- Min dî xanî rohnî bû xayet belê,
Çarî jin hatin ji ruknê menzelê,

- Ba cemal û husn û nûranî qemer,
Hulleê îstebreq û sundus di ber

- Le’lîha têr ew ji ava kewserê
Zulfî ha sed te’ne dane enberê

- Bejn û bala serwû sîma û şefaf
Min şuphandin tuxmeê Ebdulmenaf

- Yek li destê rastê hat û yek li çep,
Yek li pişt û yek li pêşem, ba edeb

Ew kî bûn? - Hewwa û Sara, Asiye
Ya li pêşem Meryema ‘Imraniye

- Meryemê husn û melahet zêde bû,
Palvedabû ew ji bo min tekye bû

- Nagehan bû zemzem û tesbîh û deng,
Ba luxetha yê muxalif reng û reng

- Rast û çep min dî kewakib têk firîn
Qafi ta qafê cîhan bûn enwerîn

- Pêkve dunya min didî bû qurs û nûr
Meşriq û mexrib didîtin min ji dûr

- Keski alayek di mexrib da me dî
Yek li şerqê, yek li banê Ke'bê dî

Emrê Cebraîl kirî mîrê mezin,
Mujde da ehlê semawat û zemîn

Daketin dergahê nîran nagehan
Şahiyanê hor û rîdwanê cînan

Xulxulîn horî di qesrê cennetê
Kî dizanit kar û barê qudretê?

Hate Cibrîl û melaik fewce fewc
Çar kenarê Mekkehê bûn mewce mewc

- Nagehan ez tehnî bûm wê saetê,
Min dî da destê me camek şerbetê,

- Sipî yû wek şîr e, şêrîn wek ‘esel
Nê ji wî, şîr û ‘esel bûye mesel

- Min vexwar û tihnî çû fîlhal ji min
Teyrekî spî hat û ber malê di min

- Wê demê min bû Muhemmed Mustefa
Nûrîcan û me’dena sidq û sefa

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat

## BEŞ-XII

Cumle zerratê cîhan da ev nîda
Kirne gazî pêkve gotin: - Merheba

- Merheba ey sirrê Furqan merhaba
Merheba ey derdê derman merheba

- Merheba ey canê Baqî merheba
Merheba ‘uşşaqê saqî merheba

- Merheba ey ‘alî sultan merheba
Merheba ey kanî îrfan merheba

Merheba ey şemsê taban merhaba
Merheba ey can-î canan merheba

- Merheba ey qurret-ul ‘eynê Xelîl
Merheba ey xasê mehbûbê Celîl

- Merheba ey rehmeten lîlalemîn
Merheba ente şefî-‘ul muznibîn

- Merheba ey afîtabê bê zewal
Merheba ey mahitabê la yezal

- Merheba ey bulbulê baxê wisal
Merheba ey aşînayê zulcelal

- Merheba ey nûrê xûrşîdê Xuda
Merheba ey tu ji heq nabî cuda

- Merheba metlûbê ‘alem her tuyî
Merheba ewladê Haşim her tuyî

- Merheba ey nûrê heq ra mezherî
Merheba ey ewliya ra serwerî

- Merheba hatî şivanê ummetê
Merheba hat bo me nûra dewletê

- Merheba ey bedrê ‘alem, ya munîr
Merheba xelqê ketî ra destegîr

- Merheba sultanê cumle enbiya
Merheba ey nûrê çeşmê esfiya

Merheba ey îftixarê enbîya
Merheba ey şem’ê cem’ê ewliya

Merheba ey menbe’ê ‘izzû wefa
Merheba ey kanî îhsan û ‘eta

Merheba hatî şefî’ê îns û can
Merheba hatî letîfê îns û can

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

# BEŞ-XIII

- Secde bir her wê demê an nûrîcan
Dest hilînandîn be sûyê asûman

- Pareyek ewrê spî ez asuman
Hat û hilgirt û ji min xaib bû an.

- Hateveh medhûn û pêçayî kehîl.
Pare ewrek dî gihîştê, bû delîl,

- Girt û bir, lê hate guh min ev xeber:
Girtî wî dunya seraser behr û ber.

- Hateve-spî pare ermîşek digel
Wê mijî ba le'lî wek şehd û esel.

- Lê belê xweş hate guh min ev nîda:
Pêkve zanî xelqahayê enbiya

- Min dî xanî bû ji teyran rengereng
Dîm ji zumrûdan û hem yaqût e çeng.

- Paşê hatin seh nefer, lê her yekî
Husn û sûret mislê qursa rojekî

- Yekî der dest wî misîn û yekî teşt
Yekî anî cameê spî ez beheşt.

- Hefti caran şûşt û pêçan pir xeber
Gotinê û hersê rabûn çûne der

- Naête hed û hîsabê mu'cîzat
Muxteser min gotiye n'et û sîfat

- Dê çi bêjim n'et û zatê enwerî?
Ê ku 'alem cumle bo wî çêkirî!

Mun'ekîs bûn wê şevê hindî senem
Agirê Faris vemirya bû 'edem

Taze eywan xaneê Noşîrewan
Rast û çep hejya û lerzî nagehan

Şeq bû kungir çarideh jê çûne xwar
Xewf û tirsek hate Kîsra bê qerar

Behrê Sawe çikya û hişk bû nihan
Wadiya nav lê Semawe bû rewan

Ez serê hindî mulûkan taci ket
Zêdebû lê tirs û fikr û zelzelet

Der duşembe duwazdehê ewwelrebî’
Salê fîlî hati ew hemlê bedî’

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ’işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-XIV

Rabû Ebdulmuttelib têkil seher
Got: - Me dî zemzem kete Rukn û Hecer

- Ke’be çû secde, mubarek bû meqam
Rukn û Ban û Beytî lê dikra selam:

- Rukneha “Ellahû Ekber” jê dihat
Hati mizgîna Muhammed esselat

- Paki bûm ez, Lat û Uzza û senem
Hat Ebul Qasim şehî ‘alî ‘elem

- Rast û çep xweş hate zîba erxenûn:
Nê Muhemmed hat û pût bûn sernixûn

- Hatin îbrîq û legen, misk û gulav,
Ke’be şûştin, mame heyranê tewaf.

- Ez bi derkeftim ji babê, Şeybe zûd
Min Sefa û Merwe dîtin der sucûd.

- Belgê dar û ber ji feyza “La yemût”:
(Caena Ehmed Resûlullah-î) got.

- Hati awazek: - Eya meznê Qureyş,
Ew çi tirs û lerzî ye? Ey tîbê eyş.

Rabû Ebdulmuttelib xweş hate mal
Teyrekî mazin li banê çenk û pal.

Bêhna fîrdewsê ji hucra Amîne
Hat û der hingavt û go: - Ya Sakîne.

Amîne hat û ew-î jê kir sûal:
- Kanê ew nûra digel te, ey şepal?

Amînê bo got ê: - Mewlûda mezin
Hatifî navê “Muhemmed” gote min,

- Wê di xewnê da de ye nûra mubîn
Ger divêtin tu bibînî, dê bibin

Reft û Ebdulmuttelib bo dîtinê
Şîr di destê nagehan yek rehzenê

Ne’reê zed hate Ebdulmuttelib
Heybetê girt û dilê wî murte’ib:

- Naête dîtin heta sê roj temam
Ta melek bêne tewafê xas û am.

Hati Ebdulmuttelib bê xweş biten
Bê tekellum maye ezman û dihen

Paşî çendê dîtî ew nûra sebî:
- Rohniya çavê di bapîrê xwe bî

Amînê şîr da dihanê şekkerîn
Ta gehîştî weqtê teslîma deyîn

Amînê got: - Min di xewnê da diye:
Murdî’e, dê bit Helîma Se’diye.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ’işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-XV

Mekkiyan godek didane şîrî dar
Da di germê da nebin godek nezar

Hem qebîla Se’diye, dîger bulûk
Her dihatin ta Mekke, telbê biçûk

Wê qebîla Se’diye lê bû xela
Mêr û jin pêkve ji birsan mubtela.

Got Helîme: - Rojekê em çend heval
Bo giyayê çûne nava yek newal

- Hem giya jî tê hebû hem ava sar
Min giya xwar û ji avê hem vexwar

- Hem hevalan jî giya û av vexwar
Hatî awazek xûdanê nadiyar.

Ha nihan biçne Mekke ey cumle jin,
Da mubarekbin ji mewlûda mezin,

- Xurrem ew zîba deyîn bo xwe bibit
Xweziya bustanê ku şîr jê bixwut.

- Tirsi xalib bû li me, em hatne mal
Gote: - Haris ew çi hale ey heval?

- Min ji bo wî got, ewî got: - Ey hebîb
Belkî ew mewlûd ji bo me bit nesîb.

- Min welet bû Dumrete, ya dî çikem?
Qet ji tirsan min nizanim dê çikem!

- Nagehan min dî di xewnê da yekî,
Ez birim avêtime rûbarekî,

Spî yû wek şîr û şêrîn şehdewar
“Jê bixwe” wî gote min sê çarî car.

- Ez vexwarim bûme jê têr û tijî
Her du bustanê di min şîr jê rijî.

- Sahiban ez dîtim û pirsîn dirêj
Lîki tenbih bû li min, bo kes mebêj.

Yek xerê laxer, hebû lê pir kesad
Haris anî taze kurtan lê nihand

Kariwan rabû bi qesda Mekkete
Bûm suwar û hem li ber min Dumret e.

- Dûra- dûra kariwanê leng û lûk
Ker ji çûnê bû we Haris ma xudûk,

- Gote min: - Wer da biçin, bî zehmetê
Min digotê: - Hatî nûra dewletê,

- Dê biçîne pêşî ocaxa Qureyş
Belkî halê me bibîtin taze ‘eyş.

- Min dî yek merdê tewîlê enwerî
Ba serê remzê îşaret da Ker î:

- Ya Helîme îsrî’î mizgîn li te
Tu dîyînî bo Muhemmed, xwezya te.

- Tîzi çû ew xweş Kerê laxer meyan
Wî berahî bir ji hindî kariwan.

- Ewwela min kir li Bethaê nezer
Çar teref pêkve giya û lale ter.

- Kariwan danî l’çiyayê Tiybê ‘eyş
Jin hemî geryan li eşrafê Qureyş

Goti Ebdulmuttelib: - Xweş Amînê
Nê divêtin bo Muhammed dayînê

Qale: “Hazel emrû mînhû qed beda”
- Hate goşê min ji hatif ev nîda:

“Sefwetur rehmanî xeyr-ul murselîn”
- Nîne ez xeyri Helîme wê deyîn.

Hatine nik Amîne jin ba surûr
Herçî zanî, ew yetîme, çûye dûr.

Îxweş ew zîba yetîmê şîrî xwer
Her du ‘alem jêrê ferman ser bî ser

Îxweş ew re’na yetîmê şîrico
Nûrê her du ‘alem ez rûxsari o.

- Ey Helîme hilgire an pakî zat
Dewleta baqî û daîm bo te hat.

Hat Helîme gote Ebdulmuttelib
Halê salê, halê qetha mudterib:

- Hatime bo yek pûser, ez bim deyîn
Ger li nik te wê hebî, “n’îm-el emîn”

Goti Ebdulmuttelib: - Namêt çî ye?
Goti: - Navê min Helîme Se’dî ye.

Goti Ebdulmuttelib: - Xweş mihdî tu,
Hem be hilm û hem be husn û Se’dî tu,

- Wê li nik min nûrê çeşmê qûtîcan,
Mislê wî neybûne, nabin der zeman,

- Lê yetîm e, durr e, bê misl e mehey,
Ez cihê babê me, ger dê tu bibey.

Gote Ebdulmuttelib: - Da ez biçim
Bêjime zewcê xwe, pirsê pê bikim.

Hate gote Haris: Ey zîba xîtab?
Ya Helîme, weyhekê wî da cewab:

- Dê çikey tu ba yetîmê bê peder?
- Ma Helîme damena sebrê biger.

Hate çû nik kariwanî kir cihêz
Dîtî Haris rohnikê wê bûne rêz.

Haris gotê: - Ez dibînim tu xudûk.
Goti: - Heqqe dê biçim ez bê biçûk?

Gotê: - Hanê bîne wî tiflê yetîm,
"Qed tewekelna 'elellah-îl kerîm"

Xweş vegerya pêşî Ebdulmuttelib:
- Hatime durdaneyê te, ey muhib.

- Da biçîne pêşî danaê emîn.
- Min ku dî ew husn û dîdara şîrîn,

- Yek regem xalî nema ez muhbetê
Bûme yexsîra wî ez wê sa’etê.

Xweş dema hilgirt, kenî bê hed gelek.
Nûrê xende, lahiqê çerxa felek.

- Bûse da min her du çavê enwerîn
Xweş mijî ba her du lêvê şekirîn.

- Rast vexwar û dev ne da sedya çepê
Hişt ji bo Dumret, bi îlhama Xudê.

- Weqtê çûnê hatî Ebdulmuttelib
Da me zad û tişt û min got ya muhib,

- Min bes e, ew godekê nûrîn cemal
Dewlemed im, dê çikem ba tişt û mal?

- Xwestî xatir min ji Cedd û Amîne.
Amîne hilgirt û ew nazik tene.

- Dabû ber bihna xwe, rohnik bûne çem:
- Wa Muhemmed tu biçî, ez dê çikem?

- Dûriya te sohtî qelbê Amîne.
Lê çikem, ew şuxle ne b’destê min e.

- Ey hebîbê min Muhemmed, ey delal.
Bêje, da rohnik nebarin bo te al.

- Tu bike ferwar û da sebr û sikûn
Bo me bêtin, wer ne, can û dil me çûn.

- Tu emanetê Xuda bî, ey cîger.
Ey Helîme “fî emanîllah” biber.

Bir Helîme bo xwe ew durra yetîm
Xweş ew e, bûye deyîn Se’d û Helîm.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ’işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-XVI

Subhê rabû kariwanê Se’diyan
Ew kerê laxer di pêşî kariwan

Haris anî bo Helîme lê siwar
Paxila rastê Muhemmed tê veşar

Ya çepê danîbû tê da Dumret e
Ker sivik çû, çabik û bê zehmet e

Ewwela çû, Ke’be sê car secde bir
Saniyen ew hate çûne, pur huner

Dî kusan ew ker nebî çûn xweş çelenk
Wê li pişta wî suwarê neh felek

Ew kerê laxer di pêşî kariwan
Wek siha teyrê li deştê bû rewan

Se’diyan gotin Helîme: - Ey heval
Ew kerê laxer me go, naçîte mal,

Vê demê, sê lê suwar in, mislê teyr
Wê diçîtin, nagehê wî kes bi seyr?

Ker bi ezman hat û gote Se’diyan:
- Qet ‘ecaîb nîne çuna min ‘eyan

- Wê li pişta min Resûlê Rebbê ‘erş,
Jêri destê wî, ji erşê ta be ferş.

Seyyîdê mexlûqê Rebb-il ‘alemîn
Çêtirînê ewwelîn û axerîn.

Qewmê Se’dî pêkve gotin ev meqal:
- Nîne ew qewl û seda, îlla xeyal.

Mislê bayê kefte rê û her bi xar
Dane seryek koh û deşt û kohîsar

Wê Helîme got bi ezman ev beyan:
- Em bi dûrkeftin ji xelqê kariwan,

- Min dî sakin, erbe’ûne rahiban
Tabi’ê usqûfekî eswed qeban

- Wî digote rahîban wesfê hebîb
Weqt e rabit ew Muhemmed ‘en qerîb,

- Kasirê esnam û qettalê cuhûd,
Bê ‘eded nîşanê wî hatne wucûd.

- Ez ji wan borîm û çendî ne gelek
Şu’leê nûra Muhemmed çû felek.

- “Wey hewar e” gotî usqûfê kebîr:
Hey ev e, wernê û qetken bi remh û şîr.

- Dest didan şîran dihatin şubhê san
Xweş li pey ma, mulhîdanê bê eman.

Dê çikem ya Reb meded mîrê mezin
Wa Muhemmed rohniya çavê di min.

- Hate nêzîkî me koma rahiban
Min Muhemmed, dî nezer da asîman.

- Hate xwarê agirê mislê şîhab
Tê werat û sotin ew ehlê ‘ezab

- Hatifî gufta ji yumna Şehsiwar:
“Uhlîk-el kuffarû, mîn-nar-îl Qehhar”

- Karîwan hat û hemî em çûne mal
Pêkve pê xweş bû nîsa û hem rîcal.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-XVII

Dewleta baqî giha nav Se’diyan
Rizq û ni’met hati, nabîn tehliyan.

Dexl û dan û ga û pez lê zêde bûn
Hem cefa û mihnet û alami çûn.

Pêkve hatin dest û pay wî ramûsan
Muhbeta wî kefte qelbê cumlekan

Hem Helîme xerqê în’am û kerem
Wê Ebul Qasim li balê, bo çi xem?

Goti: - Wellah-il ezîm, ew nazîdar
Hat û min came ne şûştin, qet tu car

- Tahir û pakîz e paqij her me dî
Bewl û xait min ji ewret qet nedî

- Bû du salî û xiraman sû bi sû.
Têkilî le’ba biçûkan qet nebû.

- Rojeka wî, heftiya yek godek î,
Heftiya wî mah û mah ba salekî.

- Ewwelê lefza wî min maye li bîr
Gote wî: - “Ellahu Ekber min kebîr”

- Salê sê nazik nîhalê rûh û can
Arizû kir wî şivanî nagehan.

- Hem bi hukmê karê ummet perwerî
Bû şivan û layiqê peyxemberî.

- Rojekê wî gote: - Mader ew bira
Kanê? min gotê: - Wî pez birye çera

- Goti: - Qet însaf e dayê, ez li mal
Ew li germê, ez vexum ava zelal

- Gote min wî: - Ez ditirsim hasidî
Bêt û te çavîn bike, ya rasidî.

- Gote dayê tu me bispêre Xudê
Min tewekul daye wî, hem tu bidê.

- Subhê min dayê ‘esa û zad û hem
Bû şivan û her du çûne ber xenem.

Ey şivanê berreê burca ber e
Jêrê gopalê te ‘alem yekser e

Ba terehhum pez çêrînî can û dil
Rehmi tu ber cumle ‘alem muştemil

Ey şivanê godekê zîba dilêr
Xwezya wî berxê ji dîdara te têr.

- Wextê êvarê şivan dê bêne mal
Ez diçûme pêşî zîbayê delal

- Gote min: - Dayê? me go: - Hatim îleyk
Ey Muhemmed sellemellahû ‘eleyk.

- Dumrete hat gote min, ev xweş cewab:
Min ji wî dîne ‘ecaib bê hisab,

- Pa ne hed, ber xişk û keski bû temam
Herçî ew dît, dar û ber lê kir selam,

- Bêjite pez ger here, ew dê biçî
Ger neçin bêjtê, xenem yek jê neçî,

- Rojekê pez bû belavê wadiyê
Min vegerandin ji tirsa ‘adiyê,

- Gote min: - Bo çi tu nahêlî di lêr
Pez biçî? Min go: - Cihê qeyxan û şêr,

- “La texef” wî gote min, pez çû çêre
Nagehani hate me yek qeswer e,

- Wî Muhemmed dît û dûvê xwe hejand
Aşîqane hate pêş û ser nihand.

- Girte goşê, gotinê yek-du mesel
Min ne fehmî wî çi gotin kir digel

- Şêri rabû êdî çû, qet kes ne dî
Pez çêrî, bû xweş û rahet kefte wî

- Anî yek pez min şikênand destî hêj
Hate pêş û destê xwe wî kir dirêj

- Destê an pez girt û malî, ba delal
Wê demê rabû bezî, mislê xezal.

- Wextê zuhrê rojeki, bî kar û bar
Dumre çapik hat û gazî kir: - Hewar

- Cote merdim bû, Muhemmed hat û bir.
Ez nizanim bo birayê min çi kir.

- “Wa Muhemmed” got û rabûn mêr û jin.
Goti Haris: - Ey Helîme way li min,

- Hate kuştin der xerîbî, berkê ‘eyş,
Ez çi bêjim pêşî salarê Qureyş.

- Pêkve rabûn xas û ‘amê Se’diyan
Lê Helîme zû gihîştî an zeman.

Gote: - Min dî der tebessüm le’lî şûr
Jê diçû çerxa felek ustûne nûr

- Bûse da min her du çavê surmeyî.
Ew çi bû hate? hebîbê min tu yî.

- Gote min: - Hatin du merdê ba cemal
Şeklê nûranî, ji nûra la yezal

- Destê min girtin revam anîme hêr
Daniya me ‘erdê û der destê kêr

- Sîneê min wî du ker kir ta bi nav
Jê deranî qelb û ehşaim tevav

- Wan bi destê xwe dilêm teqlîbi kir
Nuqteê eswed derîna jê vekir

- Gote min: - Ew behreê dêwê le'în
Min ji te avêtî, ey şahê emîn.

- Ê dî anî yek misîn û yek legen
Şûşt û nerm û pak û nazik bê mihen

- Wê demê danîne cî qelb û cîger.
Muhrekî mazin ji nûrê hate der,

- Muhreyî kir qelb û cayê bûne şeq
Hate ser yek, mislê ewrê taze berq

- Rakirim danîme cî bê zehmetî
Got: - Bikêşe ba dehan ez ummetî

- Ba dehan kêşam û ez bûme giran
Got: - Bikêşe bi hezaran, her wisan

- Hat û kêşa, ma û rakir ew hezar
Goti: - Wê nûrê cebahê gul'îzar,

- Ger bikêşî ba cemî'ê ummetê,
Dê girantir bî ji nûra rehmetê

- Herdukan ez dame ber bihna xwe saf
Her du çeşman û serê min kir tewaf

- Mislê berqa xatifa rabûn û çûn
Min didîtin ta li çerxê berze bûn.

Got Helîme, ew beyan û ew meqal:
- Min ewî hilgirt û em hatine mal.

- Qewmê Se'dî gote min: - Çi sakinî?
Rabe hilgir, wî bibe nik kahinî

- Min bire nik kahin û ew qisse got.
Kahin hilgirt û da ber sîne got:

- “Uqtulû haz-el xulame” min digel,
Werne, dê batil bike dînê hubel.

- Nagehan min dîtî yek merdê mezin
Rim li kahin da, lîbasê wî kevin.

- Qewmê kahin bûn helak, ew jî herê.
Min Muhemmed anî û hatim li rê

- Min dî yek jin ba girîbû şîn û ah
Ber kenarê bîr û ber ser xakî ah:

- Wî li min, bû yekpiser ba canî pak
Çû di bîrê ew, nîhayet bû helak.

- Min Muhemmed anîbû, min gotê: - Wer
Mu’cîze ger te hene dê bîne der.

- Wî îşaret kir bi tilya nûr î, av
Av bi ser keft û piser ber rûyê av!

- Ew ji avê hate der, rabû qiyam
Goti an dem: - Ya Muhemmed esselam.

- Hati awazek: Te’eccub nîne, ger
Ew ji bîrê godekan ku bîne der,

- Bel te’eccub ew cuwanê şehsiwar
Dê xelasket van gunehkaran ji nar.

- Paşî ez çûme serî yû her du çav.
Lê reşandin enber û misk û gulav.

- Hati dengê hatifî: - Ya Mekkete,
Ê ji te hatî, belê wê hate te.

- Ketme karî wê demê ez dem bi dem
Amîne pir jê xerîbe da bibem.

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ’işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-XVIII

Ew Xer anîbû, Helîme bû suwar
Hem li ber sîne hebîbê namîdar

Rû bi Ke’be hat û ew bê tirs û bîm
Ew kerî xweş çûn dibin hate Hetîm

Hate goşê an Helîme ev newa
Xweş nîdayê can fidayi, ez hewa:

- Ey Hetîm û ey Herem pak û temîz
Bo te hatî, bejn û balayê ezîz

- Hati sultanê felek jêri nî’al
Hati cananê du ‘alem ‘eksi xeyal

- Hati mehbûbê du sed Yusuf xulam
Hati muxtarê ku ‘erş û ferşî ram

- Hati bo te ey Mekke wextê surûr
Sed hezaran nûrê sîmayê bi nûr

- Nê tu bûyî menzîla rûhaniyan
Ta qiyamet rukbedarê haciyan.

Rast û çep vêkra Helîme kes nedî
Wê digêrî “ya teheyyur” da xwe, dî

Her peyapey hati awazek şirîn
Mustefa wê danî ser mehdê zemîn

Da biçîte telbe ket kanê kî ye
Xweş dibêjî, vî newayê aliye.

Kes nedît û hate veh, ew hadirî,
Mustefa lê berze bû, ber da girî

Deng hilînand wê li banê koçikan:
- Ah û ah durdaneê min kî revand?

Mekkiyan gotin: - Me hajê nîne qet.
Wê verêtin av û rohnik bûne şet.

Pîremêrek hate pêşî ba ‘esa:
- Wa Helîme ew çi hale bo Xuda?

- Min ji bo wê got û hal û renc û ah.
Gote min: - Wer da biçîne pêşî şah.

- Ez birim ta pêşi Uzza û senem.
Gote min: - Ew xeybezan e, pir kerem,

- Nê hezaran berze wî peyda kirin
Mislê te bê çare wî pir şa kirin.

- Secde bir wê, gote pîrî: - Ey senem
Ew Helîme hatiye pêşî te, hem

- Godekê wê der Mekke wendabû lê
İsmê an godek Muhemmed bû belê.

- Wê, Muhemmed gote Uzza û senem
Ser teşîfî hate secdê goti hem:

- Tu here ey pîrê ev çi gotine
Ew Muhemmed hatinê ‘ezla min e.

- Sernixwûn û şermezarin em ji wî
Hem kesad û bê ‘eyarin em ji wî

- Ew zeman, bo rê ku em tê xweş bibîn
Barîgaha wî gihîştê, em revîn

- Rabe ey pîra hewaê, hate roj
Bes bi navê wî dilê min tu bisoj

- Nê ji navê wî dilerzin asuman
Hem ji hubba wî kelîna behr û kan.

- Heybetê xweş girte pîrê rî spî
Wî ‘esa avêt û lerzî mislê bî.

Lê Helîme gote pîrê: - Hişe ti
- Gerçî ez ketme di behra heyretê

- Yek demê, ba wî, li min we’zê diket
Yek demê seknî bi min rehmê diket.

- Godekê min wî revandin xeybiyan
Xeybiyanê keske poşê asuman

- Ez ji kê nalem ji kî gazin bikem
Herçî ew bêjîte min dê ez wê kem

- Gotina xeybê îcazet min ne bû
Lew dibêjim Ehmedê min berze bû

- Ger bibêjim hal û esrarê derûn
Dê bibêjin dîn e, sewdaye, cunûn.

Goti wê pîrê: - Helîme vê bike
Hemdê rebbanî yû hem şukrê bike

- Haşa lîllah ew Muhemmed berze bî
Belkî ‘alem dê di wî da berze bî

- Bo Muhemmed her zeman û her mekan
Sed hezaran newbedarin pasî pan.

Zanî Ebdulmuttelib ew waqî’e
Av û rohnik çûn ji çavan damî’e

Hate ber dergahê Ke’be ew bi soz:
- Ey ‘elîmê sirrî dana yê bi roz

- Tu mûyesser ke cemala wî yetîm
Dîtina asar û îhsana kerîm

Naşibî te me eger çi koj me ye
Kîmiyayê fedl û îhsana te ye

- Tu bi heqqê fedl û îhsana ‘ezîm
Bêje min ehwalê wî tiflê yetîm.

Nagehani hati awazek letîf:
- Hanu man biçne Tuhameê şerîf

- Wê li bin dara Yemamî, bû xemam
Bû sih û sîwan di keffa wî mudam

- Pir diket tesbîh û der kef munqelib
Rabû çû telbê wî Ebdulmuttelib

Çû ku rûniştî li bin dara Yemam
Qale: - “men ente” eya şêrîn xulam?

Goti: Ey namem ji min pirsî bi lez
Ez Muhemmed îbni Ebdullahim ez

Goti: - Ez ceddê te me ey rûh û can
Ey hebîbê min ‘ezîzê xanedan.

Dabû ber sîne xwe rakir hate mal
Hate malê taze ew nûra zelal.

Amîne çav bûne rewşen wesselam
Hem ji mewlûda nebî temm-el kelam

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'işq û şewqek hûn bibêjin esselat.

## BEŞ-XIX

Ehmedê çavê te "Mazax-el beser"
Yek îşareta te "În şeqq-el qemer"

Hukmê tu carî ji erşê ta be ferş.
Ey ji nûra te munewwer tab e 'erş.

Ateşê Mûsa çi bû? ruxsarê tu.
"Wedduha" nûra dilê huşyarê tu.

Durd ji nûra te diyaê mihr û mah.
Lê "Me'ellah-il celîlê" barigah.

Nê ji ne’leyna te ey durra yetîm
Fexr û teşrîf e, ji bo ‘erşê ezîm.

Her du alem çi? siha îqbalê tu!
Sondî “Wel-leylî”, bi zulf û xalê tu.

Hem tu rûh û hem rewan û can û dil.
Pêşi bejna te, siha gul bûn xecil.

Canfedayê bejn û balayê te me.
Mest û sergerdanê sîmayê te me.

Şehriyarê çetreê ‘ewra yê tu.
Xettê şeq bû ber felek, tuxrayê tu.

Şehsiwarê duldulê kewn û mekan
Wasilê wehdet serayê lamekan

Min hebin sê sed hezar ezman û dev
Yek demê xafil nemînim roz û şev

Wesfê husna te bibêjim subh û Şam
Sed qiyamet dê biçin hêj na temam

Ya Resûlellah resûlê îns û cin
Ya şefîê sedrê eywana mezin

Tu şefa'et ke ji bo me asiyan
Wer ne, nefşa şûme nakit qenciyan

Ya Kerîm û ya Îlah-el 'alemîn
Ya Rehîm û ya Ezîm û ya Metîn

Hêvîdarê rehm û îhsana te bin
Talibê îkram û xufrana te bin

Hazirê guhdarê mewlûda Resûl
Hêviya me tu bikî ya Reb qebûl

Nê tu Xeffarî we settarê 'uyûb
Me bibexşî tu bi xufrana zunûb

Hem li da û babê hindî mu’minîn
Hem li hindê mu’mînatan ecmeîn

Tabiê an Şehsiwarê ummetê
Pêkve rabin da biçîne cennetê

Ewwela bo rewdeê şêrîn nîqab
Saniyê bo al û ezwac û sehab

Salîsa bo enbiya û murselîn
Rabîa bo ewliya û mu’minîn

Hem ji bo huccac û xuzzatan temam
Hem ji bo vê meclîsa sahib te’am

Hem ji bo her çar îmamê cadeê
Hem ji bona katibê vê nusxeê

Bo cemîê muslîmîn û salîhe
Bo feqîrê Bateê el-fatîhe!

